

## **Dezgeha Bergiriya Sivîl wê roja 11ê çile/kanûna duwem amûrên haydarkirina li dijî hêrîşên firokeyan biceribîne**

Salê du caran, di mehên çile û hezîranê de, Dezgeha Bergiriya Sivîl amurên haydarkirina li dijî êrîşên firokeyan (alarmên firokeyan) diceribîne, da ku kontrol bike ka ew dixebitin û yê ku kar nakin tamîr bike. Roja çarşemê 11ê çile/kanûna duwem demjimêr 12.00 ew dê li hemû şaredariyên ku amûrên haydarkirinê li wan hene, hişyariya «Bangeke giring – li agahdariyan bigerin» («Viktig melding – søk informasjon») biceribînin.

### **Sinyal**

Sinyal bi sê rêzan ku dinavbera wan de deqîqeyeke rawestanê heye tê şandin. Wateya sinyalê ewe ku divê hun, bo nimûne di radyo, televizyon û rojnameyan de, û liser malperên rayedaran û di medyaya civakî de li zanyariyan bigerin

### **Alarmên firokeyan**

Li Norwêcê 1,250 alarmên firokeyan li çaraliyê welêt hene, ku dê gel di bûyerên metirsîdariya giran de hişyar bikin. Amûrên haydarkirinê bi piranî li bajar û bajarokan in, û sînyal jî ji hêla nivê xelkê ve têne bihîstin. Amûrên haydarkirinê hem di dema aştîyê de hem jî di dema şer de dikarin werin bikaranîn.